Nordkurdiska
Familjepolitik

Ramyariya malbatî

Roja hilbijartinê ya li 17’yê îlonê, wê biryar li ser pêşeroja Swêdê bihêt dayin û ez û tu em bi xwe hildibijêrin. Em hemû xwedî berpirsiyarek in, graniya dengê me her yek e. Ma em ê xurtbûna civata xwe baştir yan xirabtir bikin bi vê kêmkirina kronekê ji her pênc kronên ji kîsê me yê beşdar ê bacê? Ma ew ê modêla swêdî bihêt pêşvexistin yan li cihê xwe hiştin?

Em Sosyaldemokrat dixwazin ku Swêd bibe baştirîn welat ji bo zarokan. Divêt zaro hemû bi ewletiyê mazin bibin, bikaribin pêşkevin û xem û meremên xwe pêk bihênin. Temamiya dêbavan bikaribin ji xwe re hem bixebitin û hem jî jiyana xwe ya malbatî bi ewletî bijîn. Ev ramyariya me wisan encam da, ku jinên civata me dikarin ji jinên her welatekî bêhtir beşdarê jiyana xebata civakî bibin û li Swêdê ji gelek welatên ewrûpî bêhtir zaro dihên dunyayê.

Sîgorte ji hemû dêbavan re
Me yek sîgorteya dêbavan (föräldraförsäkring) a herî kêrhatîtir a li dunyayê heye, ku ev para her welatiyek me ye. Malbatên xwedîzarok jî xwedî wê derfetê ne, ku vê derfetê ji xwe re bi baştirên awayê li wan têt, bi kar bihênin.

Me sîgorteya dêbavan bi riya dirêjkirina mehekê û bilindkirina bingehê, baştir kiriye. Nizimtirîn mafê sîgorteya dêbavan, me derxistiye rojê 180 kr sere zarokê, ku li nav wê sale zarok piştî 1’ê tîrmehê hatibe dunyayê. Î sal 1’ê tîrmehê baniya vê sîgorteyê mehê ji ser 33 000 kronî derbas dike. Ev têt wê wateyê, ku hemû dêbav heger gava ku ew ji bo sexbêriya zarokên xwe li male bin, 80% mûçeyê hatina xwe werdigirin. Her wisan jî mercên ji bo sexbêriya zarokên nexweş hatiye baştirkirinê, ku nuha derfet heye heger ku mirov xwedî zarokekî yê nexweşê gran be, dikarin sale sere zarokê ji 120 rojan bêhtir li male bimînin.

Astengek jî li ber bêhtirbûna wekheviyê ew e, ku bav pir beşek kêm ji îzna dêbavî ji xwe re werdigirin. Beşê îzna bavan van salên dawiyê xweş bilind bûye, lê hîna jî pir kêm e. Ev têt wê wateyê ku zaro kêmtir dêbavê xwe li nik hev dibînin. Bilindkirina baniya hatina salane ya sîgorteya dêbavî, ji bo di vî warî de xwe gihandina wekheviyekê,

pêşketinek baş dide xuyakirin. Lê belê ji bo xurtkirina rewşa jinan li bazara xebatê me bêhtirkirina derfetan gerek e. Em her wisan jî amade ne, ku em gelek pêşniyaran bikin da ku sîgorteya dêbavî li navbera her du dêbavan bêhtir belav bikin. Armanc diyar e. Em Sosyaldemokrat, me dive, ku di navbera dêbavan de wekheviya bi karhanîna derfeta sîgorteya dêbavî hebe.

Zarokxaneya (förskola) çak ji bo her zarokekî
Î roj me zarokxaneyên baş gerek e, ku xwedî karguzeriya pedagogîkê ye û ji her zarokî re dibe asta hînbûnê, lîstinê û ewletiyê. Zarokxane beşek grîng a hînbûna li jiyanê ye û gerek ji bo zarokan ciyek wisan be, ku zarokên ji deverên cihêreng li wir bihêne nik hev û hev li dervehiştin ne be para tu kesekî jî. Gerek çi zarokek jî ji wir ne hêne li dervehiştin, ji bo ku buhayê çûna wir gran e, yan dêbavê wan ne xwedîkar bin, yan jî li male xwuşk yan birayek wan ê biçûktir hebe. Wisan nîşan bû, ku Makstaksan baş xebitî û bû astek aborî ji bo malbatên xwedîzaro. Zarokxaneyên me baş in. Lêbelê me dive, ku di her komekê zarokan de, jimareya zarokan kêmtir bibe. Zarokxane bêhtir personel divên. Ew soza me dayî ku me yê ji ser 6000'î bêhtir personel ji zarokxaneyan re bigirta, nuha dihêt cih. Ev pêşveçûn derfetê dide ku komên zarokan biçûktir dibin.

Piştgiriya aborî ji bo hemû malbatên xwedîzaro
Piştgiriya aborî yê ji bo zaruyan (barnbidrag) piştgiriyek giştî ye û ji bo her zarokekî ye. Ev piştgirî gelek caran hatiye bêhtirkirinê, herî dawî di meha çiriya Yekem a sala 2005'ê bû, ku bi 100 kronî hat bêhtirkirinê. Her di heman demê de jî gelek serzêdayî yên bi navê serzêdayiya zarûyê (flerbarntillägg) piştî zarûkê duwemîn, hatin li darxistin. Makstaksan li sexbêriya zaruyan, bi nêzîkayî salê 20 000 kr daye malbata xwedî du zaro.

Ji bo wan malbatên ku pirtir pêwîstiya wan bi piştgiriyê heye, î sal alîkarî ji bo wan bêhtir dibe. Piştgiriya mehane ji bo zaruyan (underhållsstöd) bi 100 kronî tê bilindkirinê. Alîkariya ji bo kiriya malbatên (bostadsbidrag) xwedîzaro, mehê bi 100 – 150 kr bilindtir dibe. Her wisan jî wê serzêdayiyek ji bo xwendekarên xwedîzarok (barntillägg för studerande) amade bibe. Em Sosyaldemokrat me divê, ku bila Swêd bi berdewamî bibe baştirîn welat ji bo zaruyan. Ji ber vê hindê ye, ku em dixwazin ji bo malbatên xwedîzaro bixebitin.

Alternatîva vê
Li hevber van daxwaziyên me, hevbendiya baskê rastê (högeralliansen) di bin dolîwgeriya Moderatan de dixwazin welatek din ji welatê Swêdê ava bikin. Ew dixwazin sîgorteya ewletiya ji bo dêbavan bi çar mehan kurt bikin û perê wê jî li pileya ji 75% daxînin. Moderat dixwazin hem jî jimareya rojên ji ber zarokê nexweş li malê mayinê jî salê serê zarokê bi 15 rojan kêm bikin. Ev encam bi nêzîkî salê li ser 60 000 zarokî rû bide. Ma qey rewa ye, ku zarokê nexweş bi tenê li malê bimînin ji ber

ku Moderat bikaribin ji bo wan ên ku herî pir pere qezenc dikin bacê daxînin?

Çend ji şaredariyên Moderatan, modêla piştgiriya şaredariyê ya piştgiriya sexbêriyê (vårdnadsbidrag) bi kar hanîne. Em Sosyaldemokrat vê na pejirînin – perên vê piştgiriya sexbêriyê ji kîsê zarokxaneyan dihêt girtin û ev dikare kvalîteya karûbarê zarokxaneyan xirab bike. Di ser de jî piştgiriya sexbêriyê ya bi vî cûreyî, kemînek e ji bo jinan (kvinnofälla) û dibe sedem, ku jin bêyî ku bikaribin debara xwe bikin, êdî bêhtir li malê dimînin.

Li Swêdê wê her kes beşdar be. Ma tu kîjan Swêdê hildibijêrî?